

Nameyên Sersaxiyê

Nameyên Sersaxiyê

Ji Lênûsa bin kon

Bi navê rêxistinên Partiya AZADÎ, em sersaxiyê ji gel û millet re dixwazin...

Çûna Bavê Şiyar, ne tenê zirar ji malbata wî yan ji partiya wî re, belê ji me hemiyan re bû, ji ber ku kesên ji bona aştîyê, azadî û mafê mirovan xebatê dikin, ew dibine layên gel û welat bi tevayî.

Rêxistina: Kobanê, Serê Kaniyê, Amûdê, Qamişlo, Rimêlan, Dêrik û Heskê.

Sipas

Di têkoşîna milletê Kurd de, gelek têkoşer derketine, pirê wan ji ber zulm û zora dijminê me yê hov û ne mirovahî di demeke zû de koçberiya dawî kirine û ne gihiştine armancên ku dixwestin ji bo millet pêkbînin. Tu jî ey dost û mirovê hêja bavê Şiyar yek ji wan têkoşeran bû. Di baweriyaya min de, digel hinik cudayeti di nêrînen me de, lê bêguman, tu welatparêz bû, û çî cara me giftûgo bikira, tu bêtir ji min ve dihate naskirin. Ez bi hêvî me ku cihê te li cem wan pakrewanên milletê Kurd be!

Izeedînê Fatimê(Bavê Kîm)

20/10/2010

Bi navê Xwendekarên Zanîngeha Heskê Em sersaxiyê ji xwe re û ji we re dixwazin. Bi rastî, bavê Şiyar li gelek civatan bi me re rûnişt, herdem wî hêz dida me xwendevanan û şîretên xweş li me dikir. Ji bo em xwendina xwe berdewam bikin û em bi serkevin. Ji bo di pêşerojê de em karibin tiştêkî ji milletê û welatê xwe Sûriyê re bikin.

Dîsa em sersaxiyê ji xwe û ji milletê Kurd re dixwazin û em bi hêvî ne Xweda wî bi buhuştta xwe şa bike!

Xwendevanên Zanîngeha Heskê

21/10/2010

Birûska Rêxistina Jinan ya Helebê

Rêz û silavên hevaltî...

Em, rêxistina jinan ya partiya Yekîtî li bajarê Helebê, bi êş û jan nûçeya barkirina hevalê rêzdar, serokê partiya me mamoste Ismaîl Umer (bavê Şiyar) bihîst. Bêguman, çûna xebatkarekî mîna hevalê bavê Şiyar, ne tenê ziyana malbat û hevalên wî, lê belê ziyana gelê Kurd li der û hudir welêt û ziyana gelê Sûriyê bi hemû reng û netewên xwe ve ye.

Hevalê me bavê Şiyar, xebatkarekî dilêr û xemxwarê serbestiya civakê bû, loman jî ew ji doza jina Kurd re piştgir û alîkar bû.

Em bi navê rêxistina Jinan li bajarê Helebê serê hemû heval û hogiran nemaze yê komîta rêvebir, jin û zarên bavê Şiyar û gelê Cizîrê ser û ber sax dikin. Bi soz û peyman emê li ser riya wî berdewam bin û hêviyên wî vejînin û bibin serî.

21/10/2010

Rêxistina Jinan Ya Helebê a (PYDKS)

Birûskêk ji malpera Welatê me

Ez ji xwedayê dilovan dixwazim mehera xwe lêke û sersaxî ji malbata wî re, Kesên mîna wî di dîroka Kurdî de dimînin, serê we sax be!

Birêz malbata Ismayîl Omer.... Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê...

Bêguman koça dawî ya apê hêja bavê Şiyar derd û xemên me nûjen kirin. Bi navê malbata Rezoyê Osê sersaxiya we tevan dikim. Bere serê gelê Kurd, malbat, heval û hogirên Xwedê lê xweş be sax be. Em hêvîdar in ji Xwedayê gewr re bavê Şiyar bi rehmeta xwe şa bike.

Bere cîgehê apê hêja buhuşt be.

Malbata Rezoyê Osê